



BUROYA KURDÎ ya Pêwendî û Agahdariyê

Bultena agahdariyê N° 56 - Kanûn 2009
Quai aux Pierres de Taille (Arduinkaai) 11, 1000 Bruxelles - Tél. 02 219 80 60
www.kurdishbureau.be kurdishbureau@scarlet.be

XEBATA BUROYA KURDÎ

TEŞRÎN 2009

KONFÊRANS

01.11.2009 : Ewropa û diyardeya koçbûnê (1)



Banû Marine Imbrechts, dîrokzan, antropolog û birêvebira bernamayan ya Navenda Çanda Ewropî, rêxistineke navneteweyî ku ji aliyê Unesco hatiye nas kirin, kurteya beşa pêşên a pirtûka xwe “Koçbûn li Ewropa ji berê dîrokê heta rojên me” kir :

Tevgerên mezzin ên pêşîn

Ji dema rihên xwe yê afrîqî, mirov (insan) ji bo lêgerîna xwarinê tucar guherandina cihê xwe ranewestand, çavdêriya hawirdora xwe kir û li dawiyê ew dagîr (işgal) kir. Xuya ye ku bi destpêkirina Afrîqa, tîjebûna Cihana Kevn bi mirovan diyardeyê (fênomen) tevlihev (komplêks) e û ku bi pêlên cihê bûye. Mirovahiyên cihê, dibe ku li dû hev, ber bi Ewropa çûne. Ev pêl bi awakî taybetî hatine lê gerîn ji bo ku gelheya nûjen tê de bi awakî hergavî (dayimî) bi cî bûye û ciyê pêleke din a gelheyan, a Nêandêrtaliyan, stendiye. Toreyên (urf û adet) çandî ku hatine lê gerîn û di dirêjayiya dema Palêolîtîk de hatine nas kirin, û zanînen anatomîk û jênêtîk alîkariya têgihajtina van

diyardeyan û awayên cihê yê koçbûnan kir. Mercên (şart) van cîguhertinan di dirêjayiya berê dîrokê de ne weka hev bûn, lê ew nîşan didin ku koçbûn yek ji karaktêrên taybetî yê mirovê jîndar ê tenê ku dikare li her derî bijî, ne.

Derbasbûna ji awayê jiyana nêçîrvanên koçer ber bi ya berhemanîyên gawastî (gundiyan ku li ciyê xwe dimînin, ên ne koçer) (nêolîtîkbûn) hergav baldariyê nêçîrvanê nuh dikişîne. Modêlên cihê hatin pêşkêş kirin, ji plana sade ya koçbûnê ji Rojhilata Navîn heta pêşdeçûna pileyî (tedrîcî, hêdî hêdî) ya hundirî ya çandên nêçîrvanên dawîn ên aslî (xelkê navçê, yê ne biyanî).

Sê hawuzên mezzin ên çandî Ewropa nêolîtîk di navbera xwe de par dikin :

- Pêla “nêolîtîkkirinê” ku ji Rojhilata Navîn hatiye hemî Ewropa navendî û Deryayê Sipî dagîr (işgal) dîke.
- Mêgalîtîsm li hemî navçeyên atlantîk belav dibe.
- Çandên stêp (gihayê zuha û hişk) û daristanê li Rojhilata Ewropî belav dibin. Ev çandên stêpî heta radeyekê (derece) zimanên endo-ewropî hildigirin.

Koçbûn di dema “Antîkîtê” (çaxên kevnar) de

Ji hezar saliya 3mîn berê dema me de, pêlên koçeriyê û kartêkirinên (te’sîr) çandî ku ji stêpan tînan di destpêkê de hebûna xwe li ser Deryayê Baltîk û rojhilata Deryayê Sipî farz dikin. Ev pêl û kartêkirin ewê bigihêjin tevayiya Ewropa nuha, nemaze di warê cihêtiyan ku cihana mîzopotamî û ya sêltî “Celtique” bicarek li dijî hevdu derdixînin de.

Deryayê Sipî hergav xêzeke yekîtiyê ya rast di navbera Asya, Afrîqa û Ewropa de bû. Ji hezar saliya 3mîn de, danûstendinên bazarganiyî di navbera her sê kertan (qî'te, qarre : Asya, Afrîqa û Ewropa) de, bi riya deryayî, dibin. Ciyê Yûnanistana kevnar (antîk) şanoya tevgerên fireh ên koçberiyê ye. Ev tevger her car demeke nuh, bi hatin û bicîbûna gelheyên yûnanî yan endo-ewropî, vedikin. Li dawiya hezar saliya 2mîn, bazarganiya giravên yûnanî "thalassocratie mycénienne", weka ya şîrikên wan ên Rojhilatê, hildîweşe. Piştî valayîyeke ramiyarî (siyasî) ku ji aliyê "Gelên Derya" derdikeve, destpêka hezar saliya 1mîn firehbûna Fînîqiyân li Deryayê Sipî dibîne.

Deryayê Sipî ji aliyê Romayîyan weka goleke li navenda imperatoriya wan tê ditûn (*mare nostrum*). Dora Deryayê Sipî û Ewropa bi istikrارة xuyayî (ne kûr, sathî) ku pêşveçûneke çandî ya hergavî (dayimî) dabîn (te'mîn, garantî) dike tîn nîşan kirin. Lê tevgerên bisînortir û demkurt xuya dibin. Ew encama danûstendinên bazarganiyî, şirketên dagîrkeran yan tevgerên leşkerî ne, û encamên wan bi tevgerên dualiyî "interactions" û hundabûna çandî "acculturation" xuya dibin. Lê koçbûnên rast hema nîn in, ji derveyî (ji xeynî) dagîrkirina Galatan (Galates) di destpêka hezar saliya 3mîn a Berê Zayînê de, ku li Yûnanistanê zararên mezzin tîne û ku li dawiyê ji aliyê şahên "Pergam" tê rawestandî.

ŞÎRANIYA KURDÎ



22.11.2009 : Rêxistina Masereelfonds û navenda çandî ya flamanî De Markten Fêstivala Şîraniyê li De Markten pêk anî. Şîraniyên ji welatên cihê tê de hatin pêşkêş kirin. Buroya Kurdî bi şîraniyeke kurdî beşdarî wê bû. Û "salon dansant" jî li eywana bedew a eynikan « Spiegelzaal » hebû.

INTERLITERATOUR



29.11.2009 : 4 weqfên flamanî û 9 rêxistinên ji netewahiyên cihê li ciyên cihê li Bruksêlê fêstivaleke wêjeyî (edebî) bi navê "Interliteratour" pêk anî. Tê de fêstivaleke wêjeya ji bo zarokan jî hebû. Îsal babeta vê fêstivalê "Bajar" (De Stad) bû. Buroya Kurdî bi pêşkêşkirina Cemîl Şakelî (Amanc), nivîskarekî kurd ê çîrokên ji bo zarokan bi zimanê hollandî, beşdar bû. Wî hin perçe ji pirtûkên xwe „Een vlinder aan het raam“ (Pinpinîkek li ser pacê) û "De Witte wolk" (Ewra sipî) xwendin. Zarokên "scouts" ên 6 – 9 salî, mamosteyên wan, û hin Kurd guhdariya wî kir. Li dawiyê zarokan jê pirs pirsîn.

NÛÇE JI KURDISTANÊ

TEŞRÎN 2009

KURDISTANA TIRKIYÊ

FORUMA KONSEYA ATLANTÎK

Di 02 û 03 Teşrîn 2009 de, li Istanbûlê konfêranseke ku ji aliyê Foruma Konseya Atlantîk “Atlantic Council Forum” û Zanîngeha Amerîkî li ser pêwendiyên di navbera Tirkiye û Kurdistanê Iraqê de hat pêk anîn, bû. Masrafên wê ji aliyê Norvêjê hatin kirin.

Pêkaniyê konfêransê, David L. Philips, karbidest li Atlantic Council û mamoste li Zanîngeha Amerîkî, pisporekî Rojhilata Navîn û pirsra kurdî, nemaze ya Kurdistanê Iraqê, ye.

Ji aliyê kurdî, 14 kesahiyên (şexsiyyet) ramyarî (siyasî), bazarganiyî û çandî, ku ji wan wezîr, serokên odeyên bazarganiyê û berpirsiyarên zanîngehan, beşdar bûn.

Ji aliyê tirkî, gelek kêr beşdar hebûn : tu wezîr, bitenê komeke piçûk a rojnamevan û akadêmîkan. Ev yek, li gel seredana berê çend rojan, 30.10.2009, a wezîrê tirkî ê karên derve, Ahmed Davutoğlu, Kurdistanê Iraqê (li bultena me ya buhurî binêre). Divê ku meriv ji bo vê yekê şaş nebe, ji bo ku di Nîsan 2009 de konfêranseke weha li Washingtonê li ser Kurdistanê Tirkiyê û ramyara (siyaset) Tirkiyê di çarekirina pirsra kurdî de bû bû. Dijberiya (muxalefet) tirkî ya partiyên CHP (sosyal-démokrat) û MHP (nasyonalist) bi xurtî li dijî wê derketî bûn û iddia kir ku ramyara nuh a hukûmetê ya bi navê “Vebûna kurdî” planeke Amerîka ye. (netkurd.com, nefel.com, 04.11.2009)

TEVGER LI DIJÎ BERPIRSIYARÊN DTPÊ

Di 10 Teşrîn 2009 de, dadgeha cezayên giran a Diyarbekirê 4 berpirsiyarên partiya ku bi awakî ne fermî kurdî ye, DTPê, bi 6 sal û 3 meh zîndan tawanbar (mehkûm) kirin : Nurettin Demirtaş, hevserokê berê yê partiyê; Imam Çobanoğlu, Ajda Inci û Ramazan Şimşek.

Tawanbark bi handana (teşwîqkirin) serhildanê hatine tawanbar kirin. Di 28 Adar 2006 de, piştî gorkirina 3 çekdarên PKKê li Diyarbekirê, pevçûn di navbera hêzên ewlehiyê yên tirkî û beşdarên merasîma gorkirinê de derket. 10 sîvîl hati bûn kuştin û bi dehan jî birîndar kirin.

(netkurd.com, 10.11.2009)

Di 11 Teşrîn de, polîsê tirkî 13 kes ji DTPê li mala wan, 7 li Farqînê û 6 li Istanbûlê, ragirtin. (netkurd.com, 11.11.2009)

JI 1988 DE 403 ZAROKÊN KURD HATINE KUŞTIN

Li gora ajansa ANFê, ji 1988 de, 403 zarokên kurd hatine kuştin. Hin ji wan rasterast ji aliyê hêzên ewlehiyê yên tirkî hatin kuştin û hin jî di pevçûnên di navbera van hêzên ewlehiyê, PKKê û “korucuyan” (parêzerên gund, mîlîsên kurdî ku alîkariya dewletê dikin) de derketin de mirin. Zarokê yekemîn ku hati bû kuştin Ramazan Dağ, 13 salî, bû. Yê dawîn, Mehmet Uytun, 1,5 salî, li Cezîrê (Cizre) hat kuştin. Navên 31 ji van 403 zarokan ne hatin qeyd kirin.

(netkurd.com, 11.11.2009)

BERPIRSIYARÊN TIRK DIÇIN SEREDANA ŞARE DARÊ DIYARBEKIRÊ

Di Teşrîn 2009 de, cîgirê serokê tirk, Bülent Arınç; wezîrê çandinê, Mehdi Eker; parlementerên Diyarbekirê, Kutbettin Arzu û Abdulrahman Kurt; û parêzgarê (walî) Diyarbekirê, Huseyin Avni Mutlu, çûn seredana şaredarê (serokê belediyye) Diyarbekirê, Osman Baydemir. Ev yek, berê ku ew beşdar bibin vekirina salane ya zanîngeha Diclê, li Diyarbekirê.

Cîgirê serok, Bülent Arınç, got ku merc (şart) çî bibin “Vebûna kurdî” ewê paş de neçe (li bultena me ya buhurî binêre).

Li dawiya seredanê, Mîrza Baydemir Ferhengeke Kurdî-Tirkî, ya Zana Farqînî, û Antolojiya Dengbêjên Kurd pêşkêşî Bülent Arınç kirin.

DESTÛRA VEKIRINA T.V.YÊN KURDÎ YÊN ARIZÎ

Di Teşrîn 2009 de, Encumena Bilind a Radyo û Têlêvîzyonê (RTÛK) destûra xwe guherand û benedekê ku destûr dide ku têlêvîzyon û radyoyên arizî (privé, xusûsî) bi zimanê kurdî 24 katjmêran (saet) biweşînin xist nav wê. Ev biryar di rojnama fermî ya dewletê de hat weşandin.

Ev zagona (qanûn) nuh nema binnivîsên bi tirkî farz dîke û destûr jî dide afirandina klîp û filmên kurdî.

(netkurd.com, avestakurd.net, 13.11.2009)

ŞAREDARÊ DIYARBEKIRÊ RASTÎ KURDÊN LI ÇÎNÊ TÊ

Di Teşrîn 2009 de, şaredarê Diyarbekirê, Osman Baydemir, çû Çînê ji bo ku beşdar bibe Konseya Cihanî ya Birêvebirên Taxî (mehellî) li Shenzhenê.

Karker û xwendekarên ku ku li Çînê dijîn rastî wî hatin û pirsên xwe jê re gotin. Baydemir avakirina rêxistineke hevaltiyê di navbera Diyarbekir û Shenzhenê de û şandina xwendekaran ji Diyarbekirê ji bo ku zimanê çînî hîn bibin pêşniyar kirin.

Piştê, Baydemir şaredarê Johannesburgê, yê Afrîqa Başûr, vexwend (dawet kir) seredana Diyarbekirê. (netkurd.com, 16.11.2009)

ABDULLAH ÖCALAN BI 5 GIRTIYÊN KURD RE YE

Di 17 Teşrîn 2009 de, 5 girtiyên kurd ên partiya PKKê hatin şandin zîndana Abdullah Öcalan, serokê PKKê, li girava Imrali. Ji dema ragirtina xwe di 1999 de, Öcalan

tenê li Zîndana Taybetî (xusûsî) bû. Nuha, ew hatiye birin Zîndana Tîp F, tevî 5 girtiyên nuh.

Parêzerên (avukat) Öcalan ev daxwazî 4 caran li ber Dadgeha Ewropî ya Strasburgê kiri bû û Komîta li dijî Êşkencê ya Yekîtiya Ewropî mercên zor ên tenhakirina Öcalan peyt (isbat) kiri bûn û baştirkirina wan xwesti bû.

(Hürriyet, netkurd.com, avestakurd.net, rizgari.org, azady.nl, rudaw.net, pukmedia.com, 17.11.2009)

NAVÊN KURDÎ JI GUNDAN RE

Di Teşrîn 2009 de, piştî ramyariya (siyaset) nuh a hukûmeta tirkî, ya bi navê “Vebûna kurdî”, encumena bajarê Diyarbekirê li gundan îlanên nuh ku tê de navên wan ên kurdî û ermenî, li kêleka yên tirkî, hatine nivîsîn danîn.

(netkurd.com, avestakurd.net, 25.11.2009; rizgari.org, 26.11.2009)

KURDISTANA IRAQÊ

GERRA EWROPÎ YA SEROKÊ KURDISTANÊ

Otrîş (Avusturya, Nêmsa)



Di 04 Teşrîn 2009 de, serokê Kurdistanê, Mesûd Berzanî, ji aliyê serokê Otrîşê, Hans Fisher, hat pêşwazî kirin. Di rasthatineke ku katjmêrek ajot de, rewşa giştî ya Iraq û Kurdistanê hat giftûbêj kirin.

(peyamner.com, pukmedia.com, aknews.com, netkurd.com, avestakurd.net, rizgari.org, kurdistan-news.net, 05.11.2009)

Bruksêl

Di 10 Teşrîn de, wî seredana Bruksêlê, li Beljîka, kir. Tê de axaftineke dirêj li Parlemeta Ewropî, li ber endamên Kommissiyona Karên Derve ya vê parlementê



kir. Di axaftina xwe ya bi navê “Dêmkasî û Fêdêralîsm li Iraqê. Rola Herêma Kurdistanê” de, wî ji Yekîtiya Ewropî xwest ku alîkariya Kurdistanê Iraqê, di pêvajoya (processus) xwe ya girîng ya dêmkatîkkirinê de, bike. Ev yek, bi şandina pisporan di warên perwerde, saxî û dadiyê (edalet) de, ji bo ku Kurdistan bigihêje standardên ewropî. Û wî daxwaziya xwe ya hevkarîyeke xurttir bi Yekîtiya Ewropa re di warên ramyarî (siyasî) û ewlehiyî (emnî) de ravekir. Axaftin bi kurdî bû û hat wergerandin 23 zimanên fermî yê Yekîtiya Ewropî. Piştê, giftûbêj (munaqêşe) bi parlementeran re bû.

Ev konfêrans ji aliyê cîgirê serokê kommissiyona karên derve ya Parlemeta Ewropî, Fiorello Provera, û serokê şanda (dêlêgasyon) Parlemeta Ewropa – Iraqê, Struan Stevenson, hat pêk anîn. Her du girîngiya projeya Nabucco ku destûr da Kurdistanê Iraqê ku pêtról û gaz

bişîne Ewropa û ku girîngiya erdnigariyê (coxrafi) ya Kurdistanê bêtir kir gotin. Bi ser de jî, Mîrza Berzanî ji bo ku Kurdistanê Iraqê kir « herêma bi istkrartirîn a Iraqê » (most stable area in Iraq) hat pîroz kirin.



Piştê, Mîrza Berzanî rastî Xavier Solana, Nimînendeyê Bilind ê Yekîtiya Ewropî ji bo Karên Derve û Ramiyariya Ewlehiyê (siyaseta emnê), hat. Û paşê çû seredana serokê Parlemeta Flamanî, Jan Peumans, û serokê kommisiyona pêwendiyên derve ya vê parlementê, Karim Van Overmeire. Wan li ser hevkarîyeke xurttir di navbera her du herêmên Kurdistan û Vlaanderen (Flandr) de giftûbêj kir.



Di heman (eynî) rojê de, koktêlek (réception) li Parlemeta Ewropî ji bo ramiyar, dîplomat û hevalên kurd hat pêk anîn.



Di 11 Teşrîn de, Mîrza Berzanî rastî Banû Benita Ferrero-Waldner, Kommissera Ewropî ya berpirsiyara pêwendiyên derve û ramiyariya hevsiûbûna (cîranbûn) ewropî, hat.

(krg.be, [araratnews](http://araratnews.com), TV û malperên kurdî, 11.11.2009)

DENDAN LI SER ZAGONA IRAQÎ YA HILBIJARTINAN

Di 08 Teşrîn 2009 de, piştî çend hefte civînên zor, parlemeta federal a iraqî li Bexdadê deng da zagoneke (qanûn) nuh li ser hilbijartinan. Ji 275 parlementeran, 195 amade bûn (sunnî ne hati bûn). Ji evên dawîn, 141 parlementer ew pejirand (qebûl kir). Ev serfiraziyeke dîrokî ji bo Kurdan e, ji bo ku Ereb û Tirkmenan gelek tecrube kiri bû ku jimara parlementerên kurd li vê parlementê kêmkirin û Kurdan jî bi derketinê tehdîd kiri bû.

(pukmedia.com, avestakurd.net, 08.11.2009 ; aknews.com, peyamner.com, netkurd.com, 09.11.2009)

BAZARGANIYA TIRKÎ LI KURDISTANÊ

Di Teşrîn 2009 de, aborzan (économiste) Mûsa Muhammed ji ajansa Aknews re daxuyand ku ji 2003 de karsazên (investisseurs) û karbidestên (me'mûr) Tirkîyê 4.5 milyar dolar li Kurdistanê Iraqê kar kirin. Û wî got jî ku ji vê mējuyê (tarîx) de, nêzikî 500 şîrket û 15.000 karbidestên ji Tirkîyê li Kurdistanê kar dikin.

Muhammed got ku 94% ji abora (économie) Tirkîyê ji sêktora arizî (privé, xusûsî) tê û ku di rojên nêzik de ewê Kurdistanê Iraqê karibe jê re bibe kaniya stratêjîk a pêtîrol û gazê.

Di dema seredana wezîrê tirk ê karên derve, Ahmet Davutoğlu, Kurdistanê Iraqê, di 30.10.2009 de (li bultena me ya buhurî binêre), ji aliyê wezîrê dewletê yê tirk, Zafer Çağlayan, hat daxuyandin (îlan kirin) ku ewê encumeneke tevlihev ji bo xurtkirina pêşdeçûna aborî di navbera her du aliyan de bê pêk anîn.

(netkurd.com, 06.11.2009)

ÊRÎŞ LI NAVÇEYÊN EREBKIRÎ YÊN KURDISTANÊ

Di 16 Teşrîn 2009 de, berpirsiyarê navenda polîsê « Azadî » ya bajarê Kerkûkê, Eqîd Bêstûn, ji ajansa PNA re daxuyand ku erebeyeke mînkirî li bazara Xan Xurma, li navenda Kerkûkê, teqiya. 6 kes hatin kuştin û 5 jî birîndar kirin.

(peyamner.com, pukmedia.com, 16.11.2009)

KONFÊRANS LI SER TUNDIYA LI DIJÎ JINAN

Bi hinceta (munasebet) Roja Newneteweyî ya Têkoşîna li dijî Tundiye (şiddet) li dijî Jinan, du konfêrans li Kurdistanê Iraqê bûn :

Duhok

Di 23 Teşrîn 2009 de, konfêransek li ser nehiştina tundiyê li dijî jinan, bi navê "Ber bi jiyaneke azad", li Duhokê, bi amadebûna berpirsiyarên ramiyarî û jinan, hat pêk anîn.

Sekretera Yekîtiya Afretên Kurdistanê, Kurdistan Mukriyanî, û danîşmendê (muşawir) serokê Kurdistanê ji bo karên civakî, Diyar Mizûrî, axaftinên ku wan tê de her awayê tundiya li dijî jinan bi xurtî şermezar (mehkûm, idane) kir kirin. Her du konfêranskeran projeyên hukûmeta Kurdistanê û Yekîtiya Afretan li ser mafên jinê jî pêşkêş kirin. (pukmedia.com, 23.11.2009)

Hewlêr

Di 25 Teşrîn 2009 de, konfêranseke weha jî li Hewlêrê bû. Wezîrê kurd ê hundir, Kerîm Sincarî, axaftinek kir û tê de 8 xalên li ser parastina mafên jinan, li ser bingeha bend 128 a zagona (qanûn) Kurdistanê, ravekirin. (peymaner.com, pukmedia.com, 26.11.2009)

NÎŞAN LI POLONYA JI NIMÎNENDEYÊ HUKÛMETA KURDISTANÊ RE

Di 23 Teşrîn 2009 de, nimînendeyê Hukûmeta Herêma Kurdîstana Iraqê (KRG) li Polonya, Ziyad Reûf, nîşana “Hevalê Dibistanê” ji Keşşe Jan Twardowski, li

dibistana seretayî (a pêşîn) a Bialy Kosciol, li nêzîkî Krakovî, stand. Ev yek jî bo spasîkirina wî, ji bo ku wî alîkariya diravî (maddî) da vê dibistanê.

Bi vê hincetê (munasebet), di axaftina xwe de, Mîrza Reûf li ser xwestina xwe ku pêwendiyên di navbera dibistanên polonî û kurdî de bibin israr kir û bernameyeke guherandina cuhanan û şîrîkatiyeke di navbera dibistanan de pêşniyar kir.

Ji berê, di destpêka Çirî 2009 de, Mîrza Reûf nîşaneke nexweşxana St. Ludwik, li Krakovî, ji bo alîkariya xwe ji Weqfa Saxiya Zarokan re (Children’s Health Foundation), stendi bû.

Ji salan de ye ku Mîrza Reûf li Polonya xwe daye çend çalakiyên civakî, xeyrî, çandî û nuhkirina peykeran (monuments). (Krg Polonya, Krg Eu, 24.11.2009)

KURDISTANA ÎRANÊ

AJOTINA GUHERANDINA ZÎNDANÊN GIRTIYÊN KURD

Li dawiya Çirî 2009, girtiyê kurd Fardîn Moradî ji beş 2 ya zîndana navendî ya Sinê hat birin hucreyeke tenha.

Yekîneya Mafên Girtiyên a Rêxistina Mafên Mirov “HRA” daxuyand ku ji dema tenhakirina wî de, Tu pêwendiyên Moradî bi malbata wî re ne bûn. Ew bi sîcê karkirina li dijî ewlehiya (emniyyet) neteweyî bi 3 sal girtin hati bû tawanbar kirin. Piştî derbaskirina 26 mehan li zîndana Sinê, ew di 03 Çirî 2009 de, bi awakî illêgal, hat sîrgûn kirin zîndana navendî ya Xorramabadê, li Îranê. Lê piştî dijderketina dozkarê (procureur) Xorramabadê û nepejirandina (neqebûlkirin) zîndana vî bajarî, ew hat vegerandin zîndana navendî ya Sinê. (hra-iran.org, 01.11.2009)

RAGIRTINÊN NUH LI KURDISTANÊ

Di rojên dawîn ên Çirî 2009 de, hin kes ji aliyê hêzên ewlehiyê, li navçeyên cihê yên Kurdistanê Îranê, hatin ragirtin.

Encumena Kurdistanê ya Rêxistina Mafên Mirov li Îranê (HRA) daxuyand ku jinek „Roghaye“ û zilamek „Mahmûd Çîreh“ bi tawana ku pêwendiyên wan bi dijberiya (muxalefet) kurdî re heye li Mahabadê hatin ragirtin. M. Çîreh bavê endamekî kuştî yê gêrîlla kurdî ye.

Di 01 Teşrîn de, li Neqadê, servîsên dîzî ketin mala çalakvanê sîvîl û nivîskar Hasan Aşaarî. Ew hat ragirtin û birin ciyekî nenas. (hra-iran.org, 03.11.2009)

KURDEK TÊ ÎDAM KIRIN

Di 11 Teşrîn 2009 de, endamekî PJAKê (baskê îranî yê PKKê), Ihsan Fetahyan, li zîndana Sinê hat îdam kirin. Fetahyan ji bajarê Kirmanşahê bû û di 2008 de hati bû girtin. Wî rojên dirêj mangirtineke birçîbûnê (grêva birçîbûnê) li dijî biryarê îdama xwe kiri bû. (hra-iran.org, netkurd.com, avestakurd.net, kurdistan-news.net, 11.11.2009)

BIRYARA ÎDAMKIRINA 12 KURDÊN DIN

Li gora rêxistina almanî GfbV (Rêxistina ji bo Gelên Tehdîdkirî), 12 girtiyên kurd ewê li zîndanên Îranê û yên Kurdistanê Îranê yên cihê bîn îdam kirin. (netkurd.com, 17.11.2009)

PARLEMENTERÊN KURD RAKIRINA ÎDAMÊ DIXWAZIN

Di Teşrîn 2009 de, her sê parlementerên kurd li parlamenta îranî, Ikbâl Mohammedî, Emîn Şabanî û Celal Mehmûdzade, nameyek ji wezîrê îranî yê dadiyê (edalet), Sadîk Larîcanî, re şand û tê de rakirina îdamê li îranê xwest. (rudaw.net, kurdistan-news.net, 19.11.2009)

RAKIRINA ÎDAMA DU KURDAN

Kampanya naveneteweyî li dijî îdama Kurdan encam (nefîce) da. Li gora Rêxistina Mafên Mirov li Îranê, desthilatên îranî biryara îdamkirina du girtiyên kurd, Şêrko Maarîfî û Habîbullah Latîfî, rakir. Ew ji hucreyên îdamê hatin birin hucreyên ku tê de girtiyên din hene.

(netkurd.com, 23.11.2009)

PARLEMENTERÊN KURD PIRSA KURDÎ BI MEHDÎ KERRÛBÎ RE GIFÛBÊJ DIKIN

Di Teşrîn 2009 de, parlementerên 4 parêzgehên (wilayet) kurdî yên Urmiye, Sine, Kirmanşah û Ilamê, bi serokê berê yê parlamenta îranî û yek ji namzed û reqîbên Ahmedî Nejad di hilbijartinên serokatîyî yên dawîn de, Mehdî Kerrûbî, re li ser mêkanîzmên çareyeke pirsra kurdî giftûbêj (munaqêşe) kir.

Parlementerê Serdeşt û Pîranşarê, Hasil Dase, ji ajansa kurdî Rûdawê re daxuyand ku yekîtiyek li bal Kurdan di warê daxwaziyên wan de heye û ku ev yek dikare

alîkariya dîtina mêkanîzmeke ji bo çarekirina pirsra kurdî bike. Û wî bi ser de jî got ku parlementerên kurd rastî serokê parlamentê, Rafsancanî, û Kerrûbî li ser vê babetê hatin û ku hevdiin dajon (dewam dikin).

Di dema kampanya hilbijartinên dawîn ên serokatîya Îranê de, hin partiyên ramyarî (siyasî) yên kurdî piştgiyariya Platforma Kerrûbî li ser pirsra hindikayîyan li Îranê kiri bû.

(rudaw.net, 24.11.2009)

NIVÎSKAREKÎ KURD TÊ GIRTIN

Di Teşrîn 2009 de, nivîskarê kurd Abbas Jalîlyan ji bo 15 mehan hati bû girtin. Ew bi „çalakiyên li dijî ewlehiya neteweyî“ hatiye tawanbar kirin. Wî parêzer (avukat) ne xwest û bêşûcbûna xwe daxuyand. Jalîlyan nivîskarê çend roman, helbest û pêşgotîyan e.

(azady.nl, Ekurd, 28.11.2009)

KURDISTANA SÛRIYÊ

MANGIRTINA BIRÇÎBÛNÊ YA GIRTİYÊN KURD

Di 30 Çirî 2009 de, 300 girtiyên kurd ên partiya PYD (Partiya Yekîtiya Dêmoqratik, baskê sûrî yê PKKê) dest bi mangirtineke (grêv) birçîbûnê li zîndana Adra, li Şamê, kir ji bo riswakirina (protêso) awayê ku dergevanên wan li wan dinêrin û cihêtiya ku di navbera wan û girtiyên ereb de tê kirin.

(kurdwatch.org, avestakurd.net, 03.11.2009)

160 GUNDÊN KURDÎ TÊN BERDAN

Di mehên dawîn de, piştî salên dirêj ên pelixandina desthilatên sûrî, zuhabûna (nehatina baranê) îsal û ketina rewşa wan a aborî (êkonomîk), bi hezaran Kurd bajar û gundên xwe, bi awakî ferdî yan bi hev re, ber bi bajarên erebî, weka Şam, Heleb û Humsê, diçin, ji bo ku tê de kar bibînin.

Li parêzgeha Hesîçê, li herêma Cezîrê, li Kurdistana Sûriyê, nêzîkî 160 bajar û gund vala bûne. Rûniştevanên wan di kampan de, li dora bajarên erebî, di mercên (şart) gelek xerab de dijîn û bi zorê xwarinek dixwin. Hin ji wan xwe dikujin û hin jin jî li bin tehlika destdirêjiya xwediyê karê wan in.

Li dora Şamê, li Dûma, nêzîkî 100.000 Kurd li bin konan dijîn. Hukûmeta sûrî êlektrîkê nade wan ji bo ku ew bi awakî illêgal dijîn.

(rudaw.net, 03.11.2009)

SIYASETVANÊKÎ KURD TÊ RAGIRTIN

Di 11 Teşrîn 2009 de, servîsên ewlehiyê yên sûrî yên Helebê endamêkî polîtburoya Partî Dêmoqratikî Kurd li Sûriyê (El Partî), Muhammed Salih Xelîl, ragirtin. Tawanbar (mehkûm) di 1953 de li navçeya Efrînê bûye. Ew zewicî ye û bavê 4 zarokan e.

(avestakurd.net, 12.11.2009)

5 KURD TÊN TAWANBAR KIRIN

Di 06 Teşrîn 2009 de, dadgeha leşkerî ya Qamişlî du hunermendên kurd, Muhammed Seyfeddîn El-Xudo û Nadir Newwaf, bi 6 meh zîndan tawanbar kir, ji bo endambûna rêxistineke qedexe û handana (teşwîq) kîne, li ser bîngeha bend 307 a zagona (qanûn) cezayî ya sûrî. Her du tawanbar di 13.10.2008 de ji bo çalakîyên xwe yên hunerî û folklorî hati bûn ragirtin û piştê di 13.04.2009 de hati bûn azad kirin.

Di 15 Teşrîn 2009 de, dadgeheke sûrî 3 Kurd bi 3 sal zîndan, ji bo endambûna partiyeke qedexe, tawanbar kirin.

Çavdêriya Sûrî ji bo Mafên Mirov got ku ev her sê girtî, Mustafa Cum'a Bekir, Muhammed Seîd Huseyn Umar û Sa'dûn Muhammed, bi endambûna partiya kurdî Azadî, kirina „giftûbêjên irqî yên bi kîn“ û „zararanîna rûmeta dewletê û qelskirina hestê neteweyî“, hatin tawanbar kirin. Bekir di Çile 2009 de û her duyên din di Çirî 2008 de hati bûn girtin.

(kurdwatch.org, 15.11.2009; peyamner.com, azady.nl, 16.11.2009; avestakurd.net, 18.11.2009)

DU KURD LI FIROKEXANÊ TÊN RAGIRTIN

Di 16 Teşrîn 2009 de, Banû Bêrîvan Farûq Muhammed, diya zarokêkî 4 mehî, û Selîm Ezîz li firokexana Şamê, dema ku ew ji Kurdîstana Iraqê vedigeriyan, hatin ragirtin. Banû Muhammed jina Fewzî Şengalî, sekreterê partiya kurdî « Rêkeftina Dêmokratîka Kurd li Sûriyê » ye û Selîm Ezîz jî birayê wî ye.

(avestakurd.net, 18.11.2009)

RAPPORA HUMAN RIGHTS WATCH

Di Teşrîn 2009 de, rêxistina amerîkî ya mafên mirov, Human Rights Watch, rapora xwe li ser Kurdên Sûriyê weşand. Ew tê de ji hukûmeta sûrî dixwaze ku mafên rewa yên Kurdên Sûriyê bide.

Berpirsiyara Rojhilata Navîn a vê rêxistinê, Serah Leach Whitson, dibêje ku Iraq û Tirkiyê gavên baş ji bo Kurdan avêtin, lê ku mixabin Sûriye li dijî van guhertinan e.

Rappor dibêje ku ji 2005 de 15 berpirsiyarên ramiyarî yên kurd hatin ragirtin û rexneya Sûriyê dike ku zagoneke ku destûr bide avakirina partiyên ramiyarî yên kurdî dernexistiye. Û ew dibêje jî ku Human Rights

Watch rastî nêzîkî 30 girtiyan hat, ku wan daxuyand ku hatine êşkence kirin û ku piraniya wan ji aliyê dadgehên leşkerî hatine tawanbar kirin.

HRW ji Ewropa û Amerîka dixwaze ku Sûriyê şermezar (mehkûm) bikin û jê azadkirina van girtiyan bixwazin.

(netkurd.com, avestakurd.net, 26.11.2009)

ZAROKEK Ê DU MEZZIN TÊN RAGIRTIN

Di Teşrîn 2009 de, Encumena Kurdî ya Mafên Mirov û kaniyên din daxuyand ku du zilam û zarokêkî 10 salî li gundê Jallow, qezayê Dêrikê, bi hinceta cêjna qurbanê hatin ragirtin.

Sedema ragirtina wan ew e ku zarokan agir vêxist û stranên taybetî di vê cêjnê de stiran.

Rêxistina Naventeweyî ji bo Piştgiriya Kurdên Sûriyê (SKS) bangî civata navneteweyî kir ku li dijî van acizkirin û ragirtinên dubare (ên ku tekrar dibin) yên Kurdan ji aliyê desthilatên sûrî derkeve.

(azady.nl, 30.11.2009)

NÛÇEYÊN ÇANDÎ YÊN KURDÎ

BÎRANÎNA 100 SALIYA REWŞEN BEDIR XAN

Di 09 Teşrîn 2009 de, bîranîna 100 saliya Banû Rewşen Bedir xan, ronakbîreke kurd û jina mîrê kurd ên navdar, Celadet Bedir Xan, li Hewlêrê bû.

Merasîm bi amadebûna wezîrê kurd ê çandê, Dr. Kawe Mehmûd, û kesahiyên (şexsiyyet) ramyarî û akadêmîk bû. Wezîr ciyê bilind ê malbata Bedî Xan di dîroka Kurdistanê de anî bîran.

(pukmedia.com, peyamner.com, 09.11.2009)

Di destpêka sedsala 20mîn de, Celadet û Rewşen Bedirxan ji aliyê hukûmeta tirkî hati bûn sirgûn kirin Sûriyê. Her du jî li wê derê wefat kir. Ji sedsala 19mîn de, malbata mîrî ya Bedir Xan roleke mezzin, hem di warê ramyarî û hemî jî çandî de, di dîroka Kurdistanê de lîzt. Celadet li Şamê alfaba latînî ji bo zimanê kurdî çespanî û birayê wî, Kamuran, vî zimanî li zanîngeha Sorbonê, li Parisê, hîn kir.

(Buroya Kurdî, 10.11.2009)

DU JINÊN KURD ÊN SED SALÎ

Jinek ji Kurdistana Tirkîyê, Halime Solmaza, 125 salî ye. Li gel ku ji aliyê Guinnessa amerîkî ne hatiye nas kirin, mêjuya (tarîx) bûna wê, 01.07.1884, li dayira nufûsa Bişêriyê hatiye qeyd kirin. Banû Solmaza li gundekî navçeya Bismilê dijî. Ew du caran zewiciye, 7 zarok, 57 nevî û 150 paşneviyên wê hene. Ji derveyî pirseke piçûk a bihîstinê, saxiya wê gelek baş e.

(netkurd.com, 11.11.2009; KTV, peyamner.com, 22.11.2009)

Jineke din a kurd, Halime Olecay, 135 salî ye. Ew li Agirî, li Kurdistana Tirkîyê, di 1874 de bûye û nuha li Diyarbekirê dijî. 6 zarokên wê, 54 nevî û 150 paşneviyên wê hene. Li gora “Associated Press – AP”, ew ji saxiya xwe gazin dike, lê ku ew dikare çend salên din jî bijî.

(mediakurd.com, rizgari.org, 28.11.2009)

XELATA WÊJEYÊ JI KURDEKÎ LI OTRÎŞÊ RE

Di Teşrîn 2009 de, nivîskara kurd a Tirkîyê, Nuran Ekingen, 39 salî, li Otrîşê (Avusturya, Nêmsa) xelateke wêjeyî (edebî) ku ji nivîskarên penaber re tê dayîn, stend. Wê ew ji bo gotara xwe ya bi sernivîsa “Freiheit” (Azadî) stend.

Nuran Ekingen zanînen ramyarî li Istanbûlê xwendin û ji deh salan bêtir li zîndanê ma. Ew di 2004 de hat Otrîşê.

(netkurd.com, 10.11.2009)

LE MONDE DIPLOMATIQUE KURDÎ

Di Teşrîn 2009 de, rojnama mehane «Le Monde Diplomatique Kurdî» li Ewropa derket. Ew li Almaniya ji aliyê şirketa “Rûdaw Media GmbH”, û li Kurdistanê ji aliyê «Rûdaw Media Company», tê weşandin. Ew bi kurdî ye û li ser entêrnêtê jî tê xwendin. Hin ji gotarên wê ji aliyê Kurdan hatine nivîsîn û hin jî ji fransî hatine wergerandin. Ew piştgiriya rojanam heftane «Rûdaw», ku li Almaniya tê weşandin û ku li «kyoskên» piraniya welatên ewropî, ku ji wan Beljîka, tê firotin, distîne.

(rudaw.net, pukmedia.com, netkurd.com, nefel.com, rizgari.org, 12.11.2009)

RÊXISTINA HEVALTIYA KURDISTA-JAPON LI HEWLÊRÊ

Di 19 Teşrîn 2009 de, di merasîmekê de, Rêxistina Hevaltiya Kurdistan-Japon (Yaban) li Hewlêrê, li Kurdistana Iraqê, bi amadebûna nimînendeyên serok û serokwezîrê Kurdistanê û karsazan hat ava kirin.

Serokê rêxistinê, Newzad Reşîd, got ku amanca wê ew e ku bibe pîrek di navbera Japon û Herêma Kurdistanê de, di warên aborî (îqtisadî), bazarganiyê, perwerdeyî, zanyariyê û çandî de. Û wî daxuyand ku ewê şandeke (délégation) japonî di nêzik de were seredana Kurdistanê.

(pukmedia.com, 19.11.2009)

KONFÊRANS LI SER DERSÎM Ê ELEWIYAN LI PARLEMENTA EWROPÎ

Di 19 Teşrîn 2009 de, li Parlemeta Ewropa, li Bruksêlê, konfêransek bi navê «Dersîm 1937-38, Alewî û Rola Dewletan» bû. Ew ji aliyê koma Çepê Yekbûyî ya vî parlamentê hat pêk anîn.

Di rûniştina pêşîn de, akadêmîkan ramyara (siyaset) pelixandinê ya Imperatoriya Osmaî û ya Tirkîya nûjen li dijî Alewiyan anî bîran. Di rûniştina 2mîn de, pisporan (spécialistes) axaftin li ser qirkirinên ku ji aliyê dewleta tirkî li Dersîmê, li Kurdistana Tirkîyê, di 1937-38 de, hatin kirin û li ser ramyara assîmîlasyonê kirin. Di rûniştina 3mîn de, li ser qirkirinên Alewiyan hat axaftin. Di rûniştina 4mîn de, li ser namzediya (candidature) Tirkîyê ji bo Yekîtiya Ewropî, pêspêktîvên navneteweyî û lihemberderketina salên buhurî hat peyivîn. Li dawiyê, pirs û bersiv hatin kirin.

(Parlemeta Ewropî, malperên kurdî, 20.11.2009)

KURDEK LI DANIMARKA DIBE CÎGIRÊ ŞARENDAR

Di Teşrîn 2009 de, Kurdekî Tirkîyê, Mahmud Erdem, weka cîgirê şaredarê bajarê Bronby, li Danimarka, li ser lîsta Partiya Sosyalîst a Gel, hat hilbijartin. Erdem Kurdekî ji Konya ye û ji 1969 de li Danimarka dijî.

(netkurd.com, 22.11.2009)

NÎŞANEKE ZÎVÎN LI MISRÊ JI FÎLMEKE KURDÎ RE

Di 20 Teşrîn 2009 de, filma « Penaberê Parîsê » ya fîlmçêker û lîzvanê (acteur) kurd Ahmet Zîrek nîşaneke zîvîn li Fêstivala Navneteweyî ya Fîlmê li Qahirê, li Misrê, stend. Di Tîrmeh 2009 de, ev film li Fêstivala Navneteweyî ya Fîlmê li Parîsê jî hati bû nîşan dan.

Zîrek Kurdekî Tirkîyê ku li Fransa ji 25 salan de dijî ye. Di vê filma ku diyariya diya xwe û fîlmçêkerê navdar Yılmaz Güney dike de, ew jiyana xwe ya şexsî dibêje. Wî berê pirtûkek, « Devine que ... » (Bihizre ku ...) nivîsî bû. Ji berê jî, wî di fîlmên fîlmçêkerên navdar, weka Yılmaz Güney, Costa Gavras, Sally Potter û Jean Godard, li kêleka Isabelle Adjani, Monica Bellucci û Johnny Depp, lîzti bû.

(netkurd.com, avestakurd.net, 22.11.2009)

XELATA PARLENTA EWROPÎ JI FÎLMEKE FRANSÎ LI SER KURDEKÎ RE

Di 25 Teşrîn 2009 de, filma « Welcome » a fîlmçêkerê fransî Philippe Lioret li Strasburgê Xelata « Lux » a Parlemta Ewropa stend. Ew tê de jiyana penaberekî kurd ê illêgal li Calais, li Bakurê Fransa, dibêje.

Nirxê xelatê 87.000 € ye. Ewê ev pere ji bo binnivîsa fîlmê bi 23 zimanên fermî (resmî) yê Yekîtiya Ewropî bê dayîn.

(aknews.com, rizgari.org, 26.11.2009)

FÊSTIVALA 4mîn A FÎLMA KURDÎ LI ALMANYA

Di 27 Teşrîn 2009 de, Fêstivala 4mîn a Fîlma Kurdî li Frankfort û Ingolstadê, li Almanya, dest pê kir. Ewê heta 29 Teşrîn bajo û ji aliyê Navenda Çanda Mêzopotamya û Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê hatiye pêk anîn. Ewê jimareke mezzin ji fîlmên kurdî tê de bîn nîşan dan.

FÊSTIVALA 6mîn A FÎLMA KURDÎ LI LONDONÊ

Di Teşrîn 2009 de, Fêstivala 6mîn a Fîlma Kurdî li Londonê bû. 127 fîlm tê de hatin nîşan dan. Li gora reportajeke BBC, asta (sewiye) wan bilind e.

(azady.nl, 28.11.2009)

DU XELAT JI FÎLMEKE KURDÎ RE LI CANNES

Di Teşrîn 2009 de, filma « Tukes li ser pisîkên îranî napeyive », ya fîlmçêkerê kurd ê Îranê, Behmen Qobadî, du Xelat li Fêstivala Fîlmê ya Cannes, li Fransa, stendin. Berê jî, Qobadî xelat ji bo her du fîlmên xwe, « Demek ji bo hespên serxweş » û « Kîso jî dikarin bifirrin », stendi bûn.

(kurdistan-news.net, 30.11.2009)

BRUSSELS HOOFDSTEDELIJK GEWEST
VLAAMSE GEMEENSCHAPS-COMMISSIE



Ev bulten, bi alîkariya Vlaamse Gemeenschapscommissie (VGC), bi kurdî, fransî, hollandî û inglîzî hatiye weşandin.